Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :412 nameronahi@gmail.com 13- Tîrmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Jinên Erdexanê havînê li Zozanên Serhedê ne


Jinên Erdexanî ku di havînê de dewarên xwe dibin zozanan, behsa zor û zehmetiyên jiyana li zozanan kirin. Jinan bilêv kir ku pere zivistanê deyn dikin û beramberê vî pereyî 2 mehan ji bo banedaran, mehkê ji bo pêdiviyên malê, hilberandina penêr û rûn dixebitin.

Bi hatina havînê re Erdexanî heywanên xwe dibin zozanan. Şêniyên gundê Panikê yê girêdayî nehiyeya Xoçvanê, li zozanan avahiyeke yekodeyî ji bo xwe û ji bo heywanên xwe jî axurekî çêdikin. Her wiha li gel 4 hezar dewarî, şêniyên herêmê debara xwe bi xweyîkirina qazan jî dikin. Jinan bilêv kir ku zozan ji gund xweştir in, lê belê ji bo pereyê ku zivistanê dixebitin.

### ZOZAN JI GUND XWEŞTIR IN

Ayten Yildiz ku li zozana ye, da zanîn ku ew 3 mehan li zozanan dimînin û di meha dawî de jî ew penêr, rûn û toraqê çêdikin. Yildiz, anî ziman ku ew rojê 13 çêlekan didoşe. Yildiz bilêv kir ku zozan ji gund xweştir in û got: “Ji bo me jinan zozan ji gundan rihetir in. Em serê sibehê û êvarî şîr didoşin û piştî vê em tên cem hev û sohbet dikin. Zozan ji gund xweştir in. Em jin bi berên ku em li zozanan hildiberînin û jê qezenc dikin didin ser hev û zivistanê pê debara xwe dikin.”

### LI ZOZANAN QAZAN JÎ XWEDÎ DIKIN







Sûna Yildiz jî, 30 qaz bi xwe re anîne zozanan û wan xwedî dike. Yildiz got: “Em bi qaz û mirîşkan re eleqedar dibin. Em serê sibehê êm didin qazan, paşê em wan bera mêrgê didin. Berêvarî qaz bi xwe tên an jî em diçin wan tînin. Xweyîkirina qaz û mirîşkan ne zehmet e.” Yildiz, bilêv kir ku şîrê ku li marketan lîtreya wî bi 4 lîreyî ye ew bi lîre û 20 qurîşî didin. Her wiha Yildiz bilêv kir ku dema şilî be jiyana li zozanan zehmet e û got: “Li zozanan ên zehmetê dikişînin jin in. Niha mêr li gund in û betal in. Dema çandiniyê jî mêr zehmetiyê dikişînin. Ji bo jinan jiyana li zozanan li gor a gund xweştir e. Li gund karê malê, karê baxçeyan, karê heywana heye, em dibetilin.”

deyn dikin, 2 mehan ji bo banedaran, mehekê ji bo pêdiviyên malê, hilberandina penêr û rûn

### ŞÎR DIFIROŞIM PÊ DEYNÊ XWE DIDIM

Leyla Demîr jî, anî ziman ku meheh e li zozana ye û ji bo ew heywanên xwe xweyî bikin hatine zozanan. Demîr got: “Em bi deyn pereyan ji banedaran distînin û 2 mehan ji bo wan dixebitin û şîr didin wan. Dema deyn diqede em ji bo zivistanê amadekariyên xwe dikin. Em penêr û rûn çêdikin. Li gor serê heywanê em zivistanê pere big iştî ji banedaran distînin. Hin mal 30 hezar lîre, hin jê 10 hezar, hin jê 40 hezar lîre distînin. Vê zivistanê min 5 hezar lîre stend, lê hîn min nedaye. Çimkî lîtreya şîr daketiye 95 qurîşan. Yanî em niakrin deynê xwe bidin.” Demîr, da zanîn ku dema ew ewil çûn zozanan wan ji 15 çêlekan 100 lître şîr dotiye, lê niha piştî kêmbûna baranê ev yek daketiye 60 lîtreyî...*Mujdar CAN/ MA*

## Perwerde qedandin, tevli Pêngava Bagera Cizîrê bûn

240 endamên QSD`ê piştî ku li Akademiya Şehîd Dijwar Efrîn a li gundê Genterî perwerdeya xwe qedand, soz dan û tev li Pêngava Bagera Cizîrê bûn.



Akademiya Şehîd Dijwar Efrîn dewreya perwerdeyê ya bi navê “Şehîd Serhed Hesekê” ku 240 endam ji bajarên Dêrazor, Hesekê û Kobanê tev lê bûbûn, bi dawî kir.

Perwerdeya Hêzên Sûriya Demokratîk QSD’ê 15 rojan berdewam kir û di perwerdeyê de şervanan waneyên bîrdozî û leşkerî dîtin.


Perwerde bi merasîmekê bi dawî bû. Di merasîmê de ji fermandarên QSD’ê Ciwan Genterî axivî û keda kesên ku li ser perwerdeyê disekinin pîroz kir.

Ciwan Genterî bidawîkirina perwerdeyê li şervanan pîroz kir û destnîşan kir ku wê şerê li hemberî DAIŞ`ê berdewam be hetanî ku Sûriye bi tevahî ji çeteyan bê paqijkirin. Di dawiyê de şervanên ku tev li perwerdeyê bûn, soz dan û xwe amade kirin da ku berê xwe bidin Dêrazorê beşdarî Pêngava Bagera Cizîrê bibin...*ANHA*



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 412 13 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Polîsan avêtin ser bûroya JIN NEWS’ê



Polîsên Tirk bi ser bûroya Ajansa Jinan JIN NEWS’ê ya Baglar Amedê de girt. Şeva pêr saet 00.00’an polîs çûn bûroyê, ji bo ku kes li bûroyê nebû vegeriyan.
Berê sibehê saet 04.00’an polîsan dîsa bi ser bûroyê de girt. Derî şikandin û ketin hundirê bûroyê. Hemû ode li bin guhê hev xistin. Polîsan dest li ser kompûterên ajansê danîn. Nayê zanîn bê ka bi çi sedemê bi ser bûroyê de girtine.

# RÊJÎMA NÛ Û SÎSTEMA LI ÎMRALIYÊ

Tecrîda li ser Rêberê Gelê Kud Abdullah Ocalan dewam dike. Dewleta Tirk rê nade ku malbat û parêzer herin Îmraliyê û di şexsê Ocalan de hewl dide îradeya gelê Kurd bişkîne. Nêrazîbûna gelê Kurd û dostên wan ya li hember tecrîdê jî her diçe zêde dibe.




### DIVÊ XWEDÎ LI OCALAN DERKEVIN

Parêzerê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Rezan Sarica diyar kir yên ku bi salan e sîstema li Îmraliyê bi rê ve dibin, ew kes in ku rejîma niha afirandine û got, “Hiqûqa ku li rûmeta mirovan tê, alîgirê demokrasiyê ye û mafên mirovan diyar dike, bi ti awayî nikare sîstema li Îmraliyê îzah bike. Em îro ketine pêvajoyeke ku demokrasî ji holê hatiye rakirin. Divê gel, civak û hêzên demokratîk xwedî li berxwedana destanî ya birêz Ocalan derkevin.”*R-4*

### OCALAN RÊYA AZADIYÊ NÎŞANÎ ME DA

Li Rojavayê Kurdistanê jî nerazîbûna li dijî tecrîda li ser rêber Ocalan her diçe zêde dibe. Jinên bajaroka Girbawî ya Qamişlo tecrîd şermezar kirin û wiha gotin, “Em tecrîda li ser rêberê xwe qebûl nakin. Dewleta tirk bi tecrîdê dixwaze gel ji fikrê azad ê Ocalan dûr bîxe û îradeya jina azad têk bibe. Ocalan rêya azadiyê nîşanî me da. Em ê heta dawiyê ji bo azadiya rêber Apo têkoşîna xwe berdewam bikin.” *R-*

## Li dijî dagirkeriyê divê Kongreya Neteweyî pêk were



Endamê Komîteya Rêveber a PKK’ê Qasim Engîn diyar kir ku dewleta Tirk bi mentiqê Mîsakî Mîllî tevdigere û dixwaze hemû Kurdistanê dagir bike û diyar kir ku daxuyaniyên Sefîn Dîzayî û Nêçîrvan Barzanî cihê xemginiyêne. Engîn wiha got, “Li dijî dagirkeriyê xebata sereke ya ku divê demildest were kirin lidarxistina Kongreya Neteweyî ye.”*R-4*

## Barzanî hevkarê dijminê Kurd Erdogan e




Endamê Desteya Dameziríner ê Partiya Azadî û Demokratîk a Êzidiyan PADÊ Omer Salih diyar kir ku dewleta Tirk gefan li Şengalê dike û da zanîn ku ew nahêlin komkujiyeke din li ser gelê Êzidî bê dubarekirin. Salih daxuyaniya Neçîrvan Barzanî jî rexne kir û got, “Barzanî buye berdevkê Erdogan ê dijminê gelê Kurd e.” *R-4*

## KODAR û PJAK’ê projeya demokratîkkirinê pêşkêşkirin




KODAR û PJAK’ê li ser bingeha neteweya demokratîk û xwerêveberiya demokratîk projeyek pêşkêş kirin û ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd û pirsgirêkên Îranê bang li rêveberiya Îranê kir ku vebûneke siyasî bide destpêkirin. Hate gotin, “Eger ew daxwazên civakê di projeya ku hatî pêşkêş kirin de ji aliyê dewleta Îranê ve bê bersiv bimîne, KODAR wê ji bo otorîte û rêveberiya yekalî bikeve nava hewildan û têkoşînê.” *R-2*

## Trump zextan li endamên NATO’yê dike



Serokê DYA’yê Donald Trump gef xwar û diyar kir ku hevkarên wan ên li NATO’yê lêçûnên xwe yên leşkerî zêde nekin ew ê ji tifaqa Atlantîkê derkevin. Li gorî agahiyên civîna NATO’yê ya li Brukselê, Trump ji endamên tifaqê xwest ku bila 2 ji sedî dahata xwe ya neteweyî ji bo lêçûnên xwe yên parastinê bi kar bînin. *R-4*

## Çeteyên êrîşî Efrînê kirî li Idlibê hatin kuştin




Berdevkiya Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê ragihand, li başûrê Îdlibê operasyonek lidar xistine û 5 çeteyên dagirker hatin kuştin. Hat ragihandin ku ev çeteyên hatî kuştin di dagirkeriya Efrînê de xwedî rol in. Çeteyên ku hatine kuştin navên wan wiha ne: Hisên Îbrahîm Mustefa, Mihemed El-Kermo, Eymen El-Xalid, Xezwan El-Hisên. *R-5*

## Ji bo azadiyê em ê têkoşînê bidomînin

Endama Rêveberiya Kongreya Star a Herêma Cizîrê Medya Mehmûd diyar kir ku di hilbijartinên avakirina meclîsên Kongreya Star de gavek pir girîng ji bo rêxistinkirina hemû jinan hat avêtin. Medya got, “Hemû jin dema ku bi hêz beşdarî çalakiyên Kongreya Star bibin wê bikaribin xwedî li nasnameya xwe derkevin û xwe biparêzin. Ji bo azadiya jinan emê têkoşînê berdewam bikin.”*R-3*



## Amadekariyên Konferansa ciwanan didomin



Li Rojava tevgerên ciwanan amadekariyên Konferansa Duyemîn a Ciwanên Rojhilata Navîn dikin. Endamê Komîteya Amadekar a Konferansê Akîf Mistefa diyar kir ku armanca konferansê ew e ku di belavkirina fikrê netewa demokratîk de ciwan bibin xwedî roleke sereke da ku ev fikir li hemû rojhilatanavîn belav bibe. *R-6*

## NAV-DEM’ê ji bo tevlêbûna festîvalê bang kir




*R-2*

## Bi rêbazên leşkerî çareserî pêk nayê

Navenda Têkliyên Dîplomasî ya Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM’ê girêdayî rewşa li Efrînê û Deraayê her wiha destûra bingehî daxuyanî da. Di daxuayniyê de hat gotin, “Dewleta Tirk li Efrînê bi hovîtiya ku dike qanûnên navnetewî binpê dike. Buyerên li Dera yê rû didin ji çareseriyê dûr in. Divê hemû gelên Sûriyê di destûra nû de cih bigirin.” *R-2*

## Dagirker Efrînê dişewitînin

Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ku li Efrînê bi her awayî zilm û zordariyê dikin, niha jî komkujiya xwezayê pêk tînin. Dexl, dar û berên Efrînê dişewitînin. Ji pêr şev de dewleta Tirk û çeteyên wê li gundên Meydankê û Racoyê, li gundê Meydan Ekbezê, li Bilbilê jî li gundê Zehrê û Şêngelê erd û darên Efrîniyan dişewitînin. *R-2*

## Gêrîla derbên giran li artêşa tirk xist

Li başûrê Kurdistanê gêrîlayên HPG’ê derbên giran li artêşa tirk ya dagirker didin. Di encama çalakiyên gêrîla yên bi bandor de artêşa tirk windahiyên mezin dide. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê hêzên gêrîla li Biradost û Geliyê Elî Dirêj li artêşa tirk dane û di encamê de 10 leşker hatine kuştin. *R-2*

# Dagirker Efrînê dişewitînin

**_Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ku li Efrînê bi her awayî zilm û zordariyê dikin, niha jî komkujiya xwezayê pêk tînin. Dexl, dar û berên Efrînê dişewitînin. Ji pêr şev de dewleta Tirk û çeteyên wê li gundên Meydankê û Racoyê, li gundê Meydan Ekbezê, li Bilbilê jî li gundê Zehrê û Şêngelê erd û darên Efrîniyan dişewitînin._**



Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li Efrînê daran û zeviyan dişewitîne. Li Meydankê û Racoyê bi hezaran donim erd û darên zeytûnê hatin şewitandin.
Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li gel zilma li gelê Efrînê niha jî komkujiya xwezayê dike; dexl û dar û berên Efrînê dişewitîne. Ji pêr şev de dewleta Tirk û çeteyên wê li gundên li Meydankê û Racoyê, li gundê Meydan Ekbezê, li Bilbilê jî li gundê Zehrê û Şêngelê erd û darên Efrîniyan dişewitînin.
Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ji 20'ê Çile ya 2018'an tevgera dagirkirinê ve, komkujiyna dike, destdirêjiyan dike, mirovan direvîne, pereyan ji wan distîne û her wiha komkujiya dîrokê û xwezayê jî dike. Di encama bombekirinên bi balafirên şer ê Tirk û tangan gelek avahî, berhemên dîrokî hatine şewitandin û hilweşadnin, bi deh hezaran donim erd şewitî ne. Dewleta Tirk a dagirker bi zanebûn dar û dexlên gelê Efrînê dişewitîne.

## Gêrîla derbên giran li artêşa tirk xist



Gerîlayên HPG û YJA-STAR'ê li herêma Biradostê li hêzên artêşa Tirk a dagirker dan. Li Geliyê Elî Dirêj di çalakiya gerîla de 10 leşkerên Tirk hatin kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî encama çalakiyên li dijî artêşa Tirk a dagirker ev agahî parve kirin:
"11'ê Tîrmehê di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de, gerîla li herêma Bradostê derbên giran li hêzên dagirker dan.
Li dijî leşkerên ku Geliyê Elî Dirêj dagir kirine, gerîla ji 2 baskan ve bi ser çeper û navendên artêşa dagirker de girtin. Di encamê de gelek çeper hatin rûxandin. Di çalakiyê de 10 leşker hatin kuştin, yek jî birîndar bû.
Piştî çalakiyê artêşa Tirk bi helîkopterên Skorsky kuştî û birîndarên xwe ji herêmê rakir.
10'ê Tîrmehê di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Delal Amed û Şehîdên Bestayê de, li dijî leşkerên Tabûra Zivingê ya li Şirnexê çalakiyên sekvaniyên pêk hatin. Di encamê de leşkerek hate kuştin, yek jî birîndar bû."

## Bi rêbazên leşkerî çareserî pêk nayê

Navenda Têkliyên Dîplomasî ya Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê girêdayî rewşa li Efrînê û buyerên li Deraayê rû didin û xebatên avakirina komîteya destûrî de daxuyaniyek da weşand.
Daxuyanî li Navenda Têkliyên Dîplomasî ya TEV-DEM'ê yê li Qamişlo yê bi amadebûna gelek dezgehên çapemenî hate dayîn.
Daxuyanî ji aliyê Berdevkê Navenda Têkiliyên Dîplomasî yê TEV-DEM`ê Kemal Akif ve hate xwendin.
Di daxuyaniyê de hate gotin ku artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê li Efrînê asta hovîtiya xwe bilind dikin û hemû pîvan û qanûnên navnetewî binpê dikin. Her wiha hate gotin ku buyerên li Deraayê rû didin nayê wateya çareseriya aloziya Sûriyê û divê rêjîm baş nas bike ku çareserî bi çalakiyên leşkerî pêk nayê.
Rewşa li Efrînê:
Destdirêjî û kirinên dewleta Tirk li Efrînê her diçe dijwartir dibin û hemû pîvan û qanûnên navnetewî binpê dikin. Evan destdirêjî di çarçoveya qirkirina gelekî berxwedêr de pêk tê. Gelek raporên navnetewî derketin û li gorî van raporan piştrast dibe ku evan destdirêjiyên li dijî welatiyên Efrînê binpêkirina pîvan û rêgezên mafên miorvan e. Ti alîkarî bi koçberên Efrînê re nayê kirin. Tirkiye dewleteke dagirker e û hebûna wê li giştî Sûriyê metirsiyeke mezin e. Her wiha li dijî hemû parçeyên Kurdistanê siyaseta qirkirinê dide meşandin. Tişta ku li Başûrê Kurdistanê rû dide berdewama siyaseta Tirkiyê ya li Efrînê ye. Tirkiye bi hemû hêz û derfetên xwe hewl dide hebûna gelê Kurd li her deverekê tune bike. Pêdivî bi helwesteke Kurdî ya xurt heye û ev helwest jî girêdayî lidarxistina Kongreya Netewî ya Kurdistanê ye. Divê hemû aliyên Kurdistanê helwesta xwe nîşan bidin da ku ev kongre were lidarixistin û destkeftî bêne parastin.
Rewa li Deraa:
Rêjîma Sûriyê hê jî bawer dike ku serkeftinên leşkerî bingeha çareseriyê ye. Çareserî ne pêkan e bi pêşveçûnên leşkerî pêk were. Tişta ku li Deraa rû dide nayê wateya ku çareseriyek ji aloziya Sûriyê re tê danîn. Divê rêjîm baş nas bike ku ji ber guhertinên pêk hatine nepêkan e weke berê vegere. Pêwîstiya çareserkirina aloziya Sûriyê bi diyalog û çareseriyeke aştiyane heye. Her wiha pêwîstî bi destûreke nû heye da ku mafên hemû pêkhateyên Sûriyê têde bêne parastin. Ev destûr divê destûrekî demokratîk be û ji aliyê hemû welatiyên Sûriyeyê ve bête hûnandin. Destwerdanên herêmî û navnetewî ji bo amadekirina lîsteyên komîteya destûrî hewldaneke nayê qebûlkirin û em bi temamî red dikin. Em dixwazin ber bi avakirina Sûriyeke nû ve biçin. Lihevkirina aliyên Sûriyê di pêkanîna çareserî, aramî û demokrasiyê de bingeh e."

## NAV-DEM'ê ji bo tevlêbûna festîvalê bang kir

NAV-DEM'ê ji bo tevlêbûna festîvala Ciwan û Sporê bang kir ku ew ê di 14'ê Tîrmehê de li bajarê Den Haagê ya Hollandayê were lidarxistin.
Festîvala Ciwan, Çand û Sporê ew ê di 14'ê Tîrmehê de bi slogana 'Azad Bike' li bajarê Den Haagê ya Hollandayê were lidarxistin.
NAV-DEM'ê têkildarî festîvalê daxuyaniyeke nivîskî weşand û banga tevlêbûna festîvalê kir.
Di daxuyaniya NAV-DEM'ê de ev bang li ciwanan hate kirin:
"Em bang li hemû endam û malbatên wan dikin ku tevlî Festîvala Mazlûm Dogan bibin a ku ciwan li her derê xwe birêxistin dikin û têdikoşin. Ew ê hemû komîsyonên me yên ciwanan, rêveber û endamên me yên ciwan, ciwanên li her çar parçeyên Kurdistanê û ew ê gelê me tevlî vê festîvalê bibin. Em bang li hemû kesan dikin ku bi awayekî xurt û bi heybet tevlî vê festîvalê bibin."

## Trûmp zextan li NATO'yê dike



Serokê DYA'yê Donald Trump gef xwar ku heke hevkarên wan ên li NATO'yê lêçûnên xwe yên leşkerî zêde nekin ew ê ji tifaqa Atlantîkê derkevin.
Li gorî agahiyên civîna NATO'yê ya li Brukselê Trump li hemberî hevkarên xwe yên li NATO'yê gotinên tund kiriye. Trump ji endamên tifaqê xwest ku bila 2 ji sedî dahata xwe ya neteweyî ji bo lêçûnên xwe yên parastinê bi kar bînin.
Li gorî RTL înfoyê Trump vê carê gef xwariye û diyar kiriye ku ew amade ye ji NATO'yê derkeve. Lê Trump piştre di civîneke çapemeniyê de diyar kiriye ku ew ji NATO'yê bawer e û di warê fînansmana tifaqê de pêşveçûnên mezin pêk hatiye.
Serokê DYA'yê vê hefteyê rexneyên xwe yên li dijî Elmanyayê jî dewam kiriye. Trump ji Berlînê xwestiye ku bila lêçûnên xwe yên parastinê zêdetir bike. Trump li ser hesabê xwe yê twîtterê got ku, "Elmanya ya ku dixwaze xwe biparêze, ji bo pêdiviya enerjiya ku ji xeta gazê ya Rûsyayê tê, bi milyaran dolar daye. Ev tişt nayê qebûlkirin."
Dema ku civîna giştî li dar diket, li ser banga Trûmp Sekreterê Giştî yê NATO'yê Jen Stoltenberg 29 endamên tifaqê ji bo lêçûnên leşkerî vexwend civînê. Li gorî medyaya Belçîkayê RTBF'ê Elmanya di serî de Trump gelek welat kiriye hedef. Trûmp bi zimanekî tund axiviye û Belçîka û Îspanya jî rexne kiriye.

## KODAR û PJAK'ê projeya demokratîkkirinê pêşkêşkirin

KODAR û PJAK'ê li ser bingeha neteweya demokratîk û xwerêveberiya demokratîk projeyek pêşkêş kirin û ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd û pirsgirêkên Îranê bang li rêveberiya Îranê kir ku vebûneke siyasî bide destpêkirin.
Komalgeha Demokratîk û Azad a Rojhilatê Kurdistanê (KODAR) û Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê (PJAK) ji bo demokratîkkirina Îranê projeyeke hevpar eşkere kirin.
Di projeya hevpar a KODAR û PJAK'ê de hate bibîrxistin ku KODAR sîstemeke ku peykera wê konfederalîzma demokratîk e, ruhê wê jî neteweya demokratîk e û PJAK jî partiyeke pêşeng e di nava vê sîstemê de.
Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku ew xwedî projeyek demokratîk û aştiyane ye û hate gotin, "Li ser wî esasî şewazên pergala komara Islamî ya Îran beramberî hebûna pirsgirêkên gelan, bi taybetî pirsgirêka Kurd bes nabîne û bi şêwazek radîkal dixwaze gavên kirdarî ji aliyê komara îslamî ya Îranê ve werin avêtin."
Di projeyê de hate destnîşankirin ku KODAR û PJAK ji Îranê vebûneke siyasî dixwaze ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd û Îranê û hate gotin, "Di çarçoveya neteweya demokratîk û xwerêveberiya demokratîk de projeyekê pêşkêş dike."
Hate diyarkirin ku KODAR çareseriyeke demokratîk û bê şer dixwaze û ji bo gavên pratîkî jî 8 rehendên hiqûqî, hemwelatî, civakî, azadiya jinê, parastin, aborî, ekolojîk û dîplomatîk destnîşan kir.
Di dawiya beşa encamê ya projeyê de jî hate gotin, "Eger ew daxwazên civakê di projeya ku hatî pêşkêş kirin de ji aliyê dewleta Îranê ve bi awayekî erênî neyê bersiv dayîn, berovajî vêya serlêdanên înkar, tinekirin û rêbazên derveyî mirovahî bide, KODAR wê ji bo otorîte û rêveberiya yekalî bikeve di nava hewildan û têkoşînê de be."



# Pêşengeha wênesaziyê ya ciwanan

**_Bi armanca pêşxistin û hînkirina ciwanan, Komîteya Çandê bi alîkariya Rêxistina Sivîl a Pel û Komîteya Ciwan û Werzîşê, pêşengehek wênesaziyê li kampa Eyn Îsa vekirin. Pêşengeh wê du rojan vekirî be. Endamê Komîteya Ciwan û Werzîşê yê Meclîsa Sivîl a Reqayê Ehmed El-Şerîf diyar kir ku armanca vekirina pêşengehê ew e ku di ciwanan de afrînerî pêş bikeve._**



Komîteya Çand û Hunerê ya Meclîsa Sivîl a Reqayê pêşengehek wênesaziyê li kampa koçberan a Eyn Îsa vekirin.
Bi armanca pêşxistin û hînkirina ciwanan, Komîteya Çandê bi alîkariya Rêxistina Sivîl a Pel û Komîteya Ciwan û Werzîşê, pêşengehek wênesaziyê li kampa Eyn Îsa vekirin. Pêşengeh wê du rojan vekirî be.
Di merasîma vekirina pêşengehê de, endamên Komîteya Ciwan û Werzîşê, Komîteya Çand û Huner, ciwanên kampa Eyn Îsa û endamên Rêxistina Sivîl a Pel amade bûn.
Di pêşengehê de derora 150 tabloyên mezin û hin tabloyên biçûk yên ku ji aliyê 75 wênesazên kampê ve hatin xêzkirin hatine daliqandin.
Meclîsa Sivîl a Reqayê tabloyên pêşengehê wê li herêma Cizîrê û Minbic jê pêşkêş bikin.
Endamê Komîteya Ciwan û Werzîşê yê Meclîsa Sivîl a Reqayê Ehmed El-Şerîf armanca vekirina pêşengehê destnîşan kir û anî ziman ku armanca pêşengehê dema ciwanan vala derbas nebe û afrînerên wan pêş bixin.
Endamê Komîteya Hunera Şêwekariyê ya Burorya Çand û Hunerê Ziyad El-Hemed jî destnîşan kirin ku tablo wê werin nirxandin û li gorî sê astan xelat werin belavkirin.



## Jiyan bi keda jinê tê hûnandin



Nofa Sîno derbarê parastina nirxên civakî û xwezayî de anî ziman ku divê jinên Kurd li mîrateyên xwe yên Kurdewarî xwedî derkevin.
Nofa Sîno ya ji gundê Til Temirê, 90 salî, dayika 7 keç û 3 lawan ku heta vî temenê xwe nûnertiya parastina çanda xwe ya kevnar kiriye diyar kir ku ew ji 15 saliya xwe heta niha xizmeta çanda resen dike û da zanîn ku jiyan bi huner û keda jinê tê hûnandin.
Nofa Sîno da zanîn ku ew ji zarokatiya xwe heta niha li gund mezin bûye û got: "Ji ber ku em li gund mezin bûn, afirînerî û baweriya me bêtir pêş diket. Ji ber ku em di nav xwezayê de bûn û qadên ji bo pêşketina xeyalên me yên zarokatî berfirehtir bûn. Em bi rihekî zindî tev digeriyan û hestên parastina çanda kevnar pêşketir diket. Me alavên nû ji axê çê dikir û bi vê yekê me hem çanda xwe ya kevnar zindî dikir û hem jî afirîneriya me pêşdetir diket. Loma çanda herî resen li gundan tên jiyîn û serkêşiya vê yekê jî jin dikin."
Nofayê anî ziman ku çanda resen bi afirîneriyê tê parastin û got: "Li gund me feyz ji xwezayê digirt û em her dem afirîner bûn. Li gund dema ku alavên xwarin û vexwarinê tunebû me bi axê çê dikir û em li xwe nediheyirîn. Me alavên wekî kûpê avê, tenûr, teşî, tifik çê dikirin. Me ji gîhayên çolê derman diafirand. Her wiha me bi gihayên çolê xwarinên xwezayî çê dikirin. Tama xwarina li gundan cuda ye. Ji ber ku li gundan her dem çanda resen tê parastin loma jiyana li gundan girîng e û herî zêde jin xizmetê ji bo vê jiyanê dikin. Mîrateyên gelê Kurd ên Kurdewarî herî zêde di nav xwezaya gundan de tên parastin loma divê em li çand û xwezaya gundan xwedî derkevin."
Nofayê anî ziman, divê gelê Kurd li dijî polîtîkayên bişaftinê çanda xwe ya resen her dem biparêzin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Her dem li dijî gelê Kurd polîtîkayên qirkirinê û yên bişaftinê ketiye meriyetê loma divê bi taybet jin li dijî vê yekê derkeve û çanda xwe biparêzin. Lewre jiyan bi huner û keda jinê tê hunandin."…***Songul Şêxo/TILTEMIR***

## Koma Mexmûrê li Rojava şanoyan pêşkêş dike

Koma şanoyê ya girêdayî Çand û Hunera Mexmûrê ku yekemîn car e derbasî Rojava dibe, li bajarê Kobanê şanoyek pêşkêş kir.
Koma Şanoyê ya Şehîd Hêvî Yekta ya Çand û Hunera Mexmûrê ku yekem car e derbasî Rojava dibe, yekemîn şanoya xwe bi navê Lêgerîna Heqîqetê li bajarê Kobanê pêşkêş kir. Şano bi amadebûna bi dehan şêniyên bajarê Kobanê li navenda Çand û Hunera Baqî Xido hate pêşkêşkirin.
Beriya destpêkirina şanoyê, bi navê Çand û Hunera Baqî Xido ya Kobanê Osman Bekî axivî û xêrhatina Koma Şanoyê ya Mexmûrê kir.
Berdevkê Koma Şanoyê ya Mexmûrê axivî û da zanîn dema ew derbasî Rojava bûn, wan xwest yekemîn car şanoya xwe li Kobanê pêşkêş bikin û got: "Kobanê cihê berxwedan û şoreşê ye."



## Çand û huner nasnameya xwe parastinê ye



**Hozan Seyîdxan**

Di vê pêvajoyê de her çiqas êrîş bi tevayî bin jî, neyar herî zêde êrîş li ser nirxên me yên çandî kirin. Êrîşên ku li ser gel tên kirin jî tê zanîn ku sedem dîsa nirxên çand û hunerî û netewî ne. Lewre ê miletekî dike xwedî nirx, xwedî rûmet çanda wî ye. Ji ber wê çand di navenda menzîla êrîşan de ye. Huner di civakê de dengê rastiyê ye. Vêya jî sedem e ku huner dibe menzîla dagirker û faşîstan. Piştî ku dagirkeran Kurdistan kirin çar perçe, bi taybetî bi pergala kapitalist modernite di warê qirkirin û pişaftina çand û hunerî de êrîşên herî dijwar kirin.
Çand mîna hemû afirandin û watedayinên civakan a di tevahiya dîrokê de karê bi şêwazekî giştî tê binav kirin. Bi zêdekirina li xwezayê ya hewldanên mirov çanda madî û manawî pêk tê. Huner jî hêzê dide afirîna çand û civakbûnê. Huner nikare ji wan cuda bê nirxandin. Girtina dest a hunerê ji van têgînan cuda wê were wateya ji hev qutkirina civak û civakbûnê, her wiha wê bingeh li nexweşiyên mezin veke. Hunerek e ji nirxên madî û manevî yên avakirina civakbûnê qut û serbixwe nabe.
Huner tê wateya herî baş rafînekirina çanda manevî û nîşandana herî delal a çanda madî. Lewra jî huner ji aliyê mirov ve tê afirandin, ne tenê ji bo civakî ye, her wiha pêşengiya civakê jî dike. Mîna sinc (exlaq) ku xerca civakê ye, civakê yekgirtî dihêle, huner jî bi felsefe û bîrdoziya xwe avakirina yekîtiya civakî mîna wezîfe digire ser xwe. Ji ber vê yekê jî ji siyasetê, an karê civakê serbixwe nikare were dîtin. Nerîn û hestên hunermend tê wateya tezahura nêrîn û hestên civakê. Lewra jî hunermend mirovê ku civaka xwe nas dike û dijî ye. Jiyana hunermend ne li gora xwe, li gor jiyana civak û gel e. Bi qutkirina hunerê ya ji dîrok û civakê re ew rizandin ji aliyê çînên serdest ve ji bo berjewendiyên xwe bikar anîn.
Wexta ku Turk, Ereb û Farisan êrîşî nirxên gelê Kurd kirin ê xwestin bi temamî ji holê rakin bi deng ê awaza xwe, bi stranên xwe, bi çîrok, destan û zimanê xwe yên dewlemend li berxwe da û bi hezarsalan xwe li ser piyan hişt. Bi govenda xwe bi şano, laqirdî û henekên xwe dewlemendiya xwe ya dîrokê ji dewletên dagirker parast. Lewre çand û huner cureyê xwe anîna ziman e. Cêreyê nasnama xwe parastinê ye.
Ol, felsefe, mîtolojî, zanist û qadên cuda yên hunerê çanda civakê pêk tînin. Bi gotineke din rew a derûnî û têgihi tin a civakê nî an dide. Bi netew-dewlet, an jî bi destê dewletê dema netewe hatin avakirin, cîhana, çandê bi berovajîkirin û qirkirineke mezin re rû bi rû re hate hi tin. Moderníteya kapîtalîst kevne opiyê bi tevahî û heqîqeta xwe qebûl nake. Yên li hesabê wê tên ji nav diki îne, li gor berjewendiyên xwe diguherînê û ji xwe re dike mal. Dîroka çandî ya li gora xwe berovajî kiriye û pê kê î takekes û civakê tê kirin.Ev jî ti tekî gelekî cuda ye. Bi navê dîrokê bêdîrokî, bi navê çandê, bêçandî tê ferz kirin. Ji bo vê yekê jî huner ji aliyê bîrdozî û felsefî ve, bi êwazekî ore gerî li dij tevkujiya çandî mîna parastina rewa gereke werê nirxandin û dest girtin. Misogere ku jiyaneke ba , xwe ik û azad bi jiyaneke rêxistinkirî gengaz e, bi jiyaneke nerêxistinkirî ne mumkun e. Lewra jî huner û hunermend bê rêxistin nabe. Li gor pîvana bingehîn a tevgera hunerê ya gelê Kurd tê xwestin were tinekirin, her wiha ji ber rastiya ku tevkujiyeke çandî tê ferzkirin nabe ku huner ji bîrdozî û rêxistinbuyînê cuda were girtin.
Huner bi êwazê rexne û helwestdayinê dikare bi êwazekî tuj û dicî de were pratîze kirin.
Di nava vê pratîzebûnê de rêxistinbûyîn û xebata rêxistinkirî ewlekariya serkeftinê ye.
Li dij nirxên ku tekosina azadize afirandiye her cure komplo, erê taybet, tasfiyekarî û siyaseta gemar a li ser gelê me tê me andin divê were dîtin û xabatên hunerî werin me andin. Bi dîtina van rastiyan û durketina ji berjewendîparezî, mulkiyetvanî û takekesî huner were afirandin wê destkeftiyên me mayindetir bike.
Tevî hewldana kûr a azadi u serkeftine, Kurdan, xeteke hunerê ya hêza xweser a ciwanan derxe der wê bibe temamkar a herî mezin ya demokrasiyê. Bi vê yekê re hunermend ku vîcdanê civakê ye bi çalakiya xwe wê behnvedanekê biafirîne û bi êwazekî derwê î be darî têko îna azadiya gelan bibe.

# Amadekariyên Konferansa ciwanan didomin

**Li Rojava tevgerên ciwanan amadekariyên Konferansa Duyemîn a Ciwanên Rojhilata Navîn dikin. Endamê Komîteya Amadekar a Konferansê Akîf Mistefa diyar kir ku armanca konferansê ew e ku di belavkirina fikrê netewa demokratîk de ciwan bibin xwedî roleke sereke da ku ev fikir li hemû rojhilatanavîn belav bibe.**



Endamê Komîteya Amadekar a Konferansa Duyemîn a Ciwanên Rojhilata Navîn Akif Mustefa anî ziman ku amadekariyên konferansê li Rojava didomin û destnîşan kir ku armanca konferansê xurtkirina rola ciwanan a di belavkirina fikrê neteweya demokartîk de ye, da ku ji hemû pirsgirêkên Rojhilata Navîn re bibin bersiv.

Li Rojava rêxistin û tevgerên ciwanan amadekariyên Konferansa Duyemîn a Ciwanên Rojhilata Navîn dikin. Derbarê mijarê de Endamê Komîteya Amadekar a Konferansa Duyemîn a Ciwanên Rojhilata Navîn Akif Mustefa anî ziman ku amadekariyên konferansê ji dema bidawîbûna konferansa yekemîn ku di Adara 2015'an de li bajarê Amedê yê bakurê Kurdistanê hate lidarxistin, dest pê kir û wiha got: "Konferansa yekemîn di sala 2015'an de li bajarê Amedê yê bakurê Kurdistanê, bi amadebûna nûnerên rêxistinên ciwanan ên Sûriye û Rojava hate lidarxistin. Ji biryarên ku di konferansê de hatin dayîn, ew bû ku konferansa duyemîn li Rojava were lidarxistin, ji ber ku Rojava wek qadeke girîng a têkoşîna gelan ji bo demokrasiyê tê naskirin. Her wiha biryar hate dayîn ku koordînasyonek were avakirin da ku biryarên konferansê û pêkanîna wê bişopînin. Koordînasyonê civîna xwe ya yekem di mijdara 2015'an de li paytexa Lubnan Beyrûtê bi amadebûna nûnerên Sûriye û Rojava, Iraq, Tirkiye û bakurê Kurdistanê û Qibrisê hate lidarxistin."

### HEVDÎTIN DIDOMIN

Mustefa destnişan kir ku amadekariyên lidarxistina konferansa duyemîn bê navber didomin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Li Rojava amadekariyên konferansa duyemîn didomin. Di çarçoveya amadekariyan de, di meha gulanê de civîneke berfireh li bajarê Silêmanî yê başûrê Kurdistanê hate lidarxistin. Di civînê de tekezî li ser girîngiya lidarxistina konferansê hate kirin. Li ser vê yekê li Rojava amadekarî têne kirin. Komîteya Amadekar hevdîtinên xwe bi tevgerên ciwanan ên kurd, ereb, suryan, ermen re didomîne. Tê payîn ku komîte dê di demeke nêzîk de encamên çalakî û amadekariyên xwe bi daxuyaniyeke çapemeniyê aşkera bike."

### CIWAN ROLA XWE BILÎZIN

Têkildarî armancên konferansê, Mustefa destnîşan kir ku ew hewl didin rola ciwanan xurt bikin, da ku karibin ji bo çareserkirina pirsgirêkên Rojhilata Navîn bibin bersiv û wiha domand: "Em hemû dizanin ku Rojhilata Navîn bûye navenda krîzê, beşê ciwanan jî pêşengên civakê de û hêza wê ya herî dînamîk e. Em jî hewl didin vê rolê bi pêş bixin, heta ku karibin ji bo çareserkirina pirsgirêkên heyî bibin bersiv û Rojhilata Navîn ji krîzê xelas bikin û civakeke exlaqî û polîtîk ava bikin. Armanca din a konferansê jî fikrê şoreşa gelên demokratîk li Rojhilata Navîn belav bibe. Em hewl bidin sîstema neteweya demokratîk di çarçoveya Rojava de sînordar nemîne, di heman demê de li tavahî Rojhilata Navîn belav bibe, ji ber çareya herî guncaw a hemû pirsgirêkên Rojhilata Navîn e."

Endamê Komîteya Amadekar a Konferansa Duyemîn a Ciwanên Rojhilata Navîn di dawiya axaftina xwe de bang li rêxistin û tevgerên ciwanên demokratîk, şoreşger, çepgir û komunîst kir ku beşdarî konferansê bibin û wiha got: "Bi hev re aloziya Rojhilata Navîn çareser bikin û Rojhilateke Navîn a demokratîk û civakeke exlaqî û polîtîk ava bikin."...*ANHA*

## EW ROJ



## Dr.Qasimlo

Farûk SAKIK

4ê Hezîrana 1989an dema ku Xûmeynî mir, hukûmeta Rafsencanî ji Kurdan re hin peyamên erênî şand. Tehranê dixwest bi Qasimlo re hin hevdîtinên nû pêk bîne. Dixwestin pêvajoya muzekereyan bidin destpêkirin. Ji bo vê yekê kesayetê bi navê Fadil Resûl ku li Viyana dijiya, ket dewrê. Dr. Qasimlo ji bo hevdîtinan Parîs pêşniyar kir, wan jî digot an Berlîn an jî Viyana. Di dawî de balefira ku Dr. Qasimlo û berpisyarê PDK-Î yê Frensa Evdilqadîr Azerî têde bûn, 11ê Tîrmehê ji Parîs rabû û êvarê saet 08 :00an li balefirxaneya Viyana-Schewechat danî.

EWROJ....
13 Tîrmeh 1989

Dr. Qasimlo saet di 15.00an de dema ku ji avahiya wezeratê derket û ber bi navnîşana hevdîtinê birê ket, haya wî ji bêbextiyê tune bû. Wesayita ku wî û alîkarê wî Evdilqadir Azerî dibir cihê hevdîtinê, ji aliyê berpirsyarê PDK-Î yê Viyana Kerim Piroty ve dihate ajotin. Dr. Qasimlo û Azerî dema nêzî Otêla Hîlton bûn ji texsiya Pîroty a şîn û marka Opel peya bûn û meşiyan. Kerim Piroty li wê derê mabû.

Dr. Qasimlo û Azerî dema ku ber bi cihê hevdîtonê dimeşiyan, her sê kesên Îranî Cafer Sahraroodi, Mustafa Ajvadi û Amir Mansour Bozorgian ji otêlê veqetiyabûn hatibûn cihê hevdîtinê.

Di berîka van 3 kesan de pasportên diplomatan hebûn. 10ê Tîrmehê hatibûn Viyanayê. Li otêlên cûda rezervasyon kiribûn, lê danê sibeya roja bûyerê, li otêla Hîlton hatibûn cem hev. Li cihê bûyerê kefşek jî kiribûn.

Li mala hevdîtinê, ji her du heyetan re Resûl derî vekir. Her du alî li dora masayek rûniştibûn û muzekereyan destpê kir. Bi tenê Amir Mansour wek ewlekarê heyeta Îran li piya sekinîbû. Hevdîtin kasetê dihatin qeydkirin.

Piştre, li gor vî kasetê ku polîsên Awistûrya aşkere kirin Qasimlo digot; "Ez dest vala venagerim û ez nikarim bibêjim ku Îran sozê Otonomiyê daye û ji bo vê yekê wê hewl bidin. " Piştî van gotinan deng bi sîlehan ket.

Bi gulleyên ku ji 2 çekan derketin, Dr. Qasimlo, xwediyê malê Fadil Resûl û Evdilqadîr Azerî jiyana xwe ji dest dan.

Ekîbên polîsan saet di 19:37an de gihştin cihê bûyerê. Ji êrîşkaran Cafer Sahraroodi birîndar bibû û di nav xwînê de dîtin. Hevalê wî Mansour Bozorgian jî nezî cihê bûyerê hat girtin.

Birîndarbûna Cafer Sahraroodi hemû planên wan ser û bin kiribû. Sahraroodi rakirin nexweşxaneyê û Bozorgian jî birin qereqola Schottenring.

Di vê çarçoveyê de Bozorgian radestî balyozxaneya Îranê kirin. Derketina derve jî qedexe kirin. 18ê, Bozorgian dixwest ji Viyana derbikeve, li balefirxanê hat girtin. Dora rojê ji bo 'talukeya bazdana wî tune ye' serbest hat berdan, bi şertek diviya ku Awustrya terk neke.

Sahraroodi 15ê Tîrmehê ji nexweşxanê derket û di îfadeya xwe de digot; "Ez li korîdorê bûm, kesek derî vekir û gulle berî min da. "

Lê hemû agahiyên ku bi dest diketin van Îraniyan îşaret dikirin. polîsan şeva bûyerê çek û evraqên motorsîklêta ku pê bazda bûn di sergo de dîtin. Şahidek jî gotibû 3 kes bi motorsiklêtê derbas bûne. Hemû pênaseyên şahidan, Sahrarood destnîşan dikirin. Lê 22yê Tîrmehê Viyana teslîmî zextên ku ji Tehranê dihatin bûn û saet 19.00an Sahrarood ji nexweşxanê hat derxistin bi balefrek wî şandin welatê wî.

Cenazeyê Dr. Evdirehman Qasimlo bi merasimek girseyî li Parîsê li goristana Kurd jî lê hebûn hat definkirin.


Ew roj, ji gelek welatên Ewropa siyasedmedarên navdar û parlementer li wê goristanê bûn. Lê balkêş bû, ji Awustirya tu kes li wê derê tune bû.

ÎROJ...

Kujer bi awayek aşkere, bê ku werin darizandin li ser zextên Îranê ji Viyana derketin. Edalet pêk nehatibû. Belê Kurd car din bibûn qûrbana berjewendiyên dewletan. Piştî komploya Viyana sala 1990an di bazirganiya navbera Îran û Viyana de ji sedî 60 zêdebûn hat dîtin. Di komploya Viyana de navê Serokkomarê berê yê Îranê Mehmûd Ehmedî Nejad derbas dibû.

Li hember siyasedmedarên kurdan ji aliyê dewleta Îranê ve her dem siyasetek taybet hat meşandin. Hin siyasedmedarên kurd hatin îdamkirin û îroj hin kes li benda roja îdamê nin.

## Kobanê amadekariya salvegera şoreşê dike



Li Kobanê amadekariyên pêşwazîkirina salvegera 6'emîn a Şoreşa 19'ê Tîrmehê dest pê kirin.

Çirûska Şoreşa Rojava, 19'ê Tîrmeha 2012'an de ji Kobanê dest pê kir û li tevahî Rojava belav bû.

Salvegera Şoreşa 19'ê Tîrmehê her sal li Rojava, Bakurê Sûriyê û tevahî Kurdistan û welatên din ên cîhanê tê pîrozkirin.

Bi nêzîkbûna salvegera şoreşê re, li kantona Kobanê amadekariyên pêşwazîkirina salvegerê destpê kir.

Di vê çarçoveyê de komîteyeke amadekar ji nûnerên saziyên sivîl û leşkerî yên kantona Kobanê hate avakirin. Komîte ji bo birêxistinkirina çalakariyan civînan lidar dixe.

Li gorî endamên komîteyê wê çalakî 14'ê mehê destpê bike. Her wiha wê mîhrîcanek were organîzekirin, tê de çalakiyên çandî, civakî û hunerî werin lidarxistin.

## Nakokiyên 20 salan hatin çareser kirin



Komîteya Lihevanînê ya Meclîsa Sivîl a Herêma Teqayê bi hevakariya Hêzên Ewlekariya Hundirîn xizmên ji êla Ziweyqat a bajaroka El-Cirniya ku ji beriya 20 salan ve nakokî di navbera wan de heye li hev anîn.

Ji beriya 20 salan, li ser parvekirina milkên li gundê Mihenawî di navbera xizmên ji êla Ziweyqat nakokî derketiye. Ji wê demê ve tu aliyan nedikarî wan li hev bînin.

Hevserokê Meclîsa Gundê Mihenawî Ebdulezîz Xêro ê ji êla Ziweyqat diyar kir ku pirsgirêka her du aliyan çend caran radestî dadeghên rêjîma Baas hate kirin, lê nehat çareserkirin.

Xêro anî ziman ku Komîteya Lihevanînê bi hevkariya Hêzên Ewlekariya Hundirîn bi her du aliyên dozê re civiyan û nêrînên wan guhdar kirin, da ku bighêjin encamekî li gorî razbûna her du aliyan. Xêro destnîşan kir ku komîteyê erd di navbera herdu aliyan de parve kir û ew li hev anîn.

Hevserokê Meclîsa Gundê Mihenawî Ebdilezîz Xêro spasiya Komîte û hemû aliyên ku ev pirsgirêk çareserkirine, kir.

## Perwerdeyê ya mamosteyan bi dawî bû



Akademiya Perwerdeya Civaka Demokratîk ji bo 25 mamosteyên Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk (KPC.D) perwerdeya bîrdozî dabû destpêkirin. Perwerdeya ku li Dibistana Alan Mihemed dihat dayîn 17 rojan dewam kir.

Di perwerdeyê de waneyên li ser "Girîngiya Perwerdê, Civaka Xwezayî, Şêwaza Xîtabê, Welatparêzî, Çand û Exlaq, Şerê Taybet, Dîroka Jin, Dîroka Sûriyê û Şoreşa Rojava, Jineolojî, Neteweya Demokratîk û Rexne û Xwerexnekirin" hatin dayîn. Dewreya perwerdê bi nirxandina waneyan ji aliyê beşdaran ve û bi tevlîbûna komîteyek ji Akademiyên Civaka Demokratîk bi dawî bû.



# Ocalan rêya azadiyê nîşanî me da

***Tecrîda li ser Rêberê Gelê Kud Abdullah Ocalan dewam dike û nêrazîbûna li hember tecrîdê jî her diçe zêde dibe. Jinên bajaroka Girbawî ya Qamişlo tecrîd şermezar kirin û wiha gotin, "Dewleta tirk bi tecrîdê dixwaze gel ji fikrê azad ê Ocalan dûr bîxe û îradeya jina azad têk bibe. Ocalan rêya azadiyê nîşanî me da. Em ê heta dawiyê ji bo azadiya rêber Apo têkoşîna xwe berdewam bikin."***

Jinên bajarokê Girbawî yê Qamişloyê destnîşan kirin ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan rêya têkoşîn û azadiyê nîşanî jinan kiriye. Jinan diyar kirin ku armanca dewleta tirk a ferzkirina tecrîda li ser Ocalan têkbirina îradeya jinên azad e.

Dewleta tirk tecrîdeke girankirî di girava Îmraliyê de li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ferz kiriye û destûr nade malbatê û parêzeran ku wî bibînin.

Derbarê mijarê de, jinên bajarokê Girbawî yê Qamişlo nêrînên xwe di vê derbarê de anîn ziman û diyar kirin ku hêzên komploger Ocalan dîl girtin lê fikrên wî azad in.

Bedriya Mihemed Ewed anî ziman ku tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd sûcek e û cihê şermezariyê ye û got, "divê hikumeta AKP'ê dev ji van polîtîkeyên xwe berde. gelên Bakurê Sûriyê û Rojava li dijî kompoloyê ne sîstema ku niha pêşketiye berhema felsefeya Ocalan e."

Jina bi navê Mizgîn Mehmûd da zanîn ku dewleta tirk bi ferzkirina tecrîdê li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, zagonên navneteweyî binpê dike û ev tişt anî ziman: "Dewleta tirk bi vê tecrîdê dixwaze gel ji fikrê azad ê Ocalan dûr bîxe û îradeya jina azad têk bibe." Mizgîn Mehmûd diyar kir ku ew ê ji bo azadiya Ocalan dê çalakiyên xwe bidomînin.

Fatma Hesen jî bi bîr xist ku ev 2 sal e tecrîdeke giran li ser Ocalan hatiye ferzkirin û wiha got: "Em vê tecrîdê qebûl nakin, Ocalan ji bo azadiya jinan têkoşîneke mezin daye meşandin, rêya azadiyê nîşanî me kiriye, lê di dinyayê de tu hêzê yan jî sîstemê ev yek nekiriye."

Fatma bêdengiya navneteweyî ya li hemberî binpêkirinên dewleta tirk rexne kir û wiha got: Dewletên ku qaşo banga demokrasiyê dikin, îspat kirin ku ew berjewendiyên xwe diparêzin û mafên gelên bindest ne di xema wan de ne."

Di dawiya axaftina xwe de Fatma diyar kir ku ew heta rakirina tecrîdê û azadkirina Ocalan dê çalakiyên xwe bidomînin…ANHA







## Herî zêde jin mexdurên dagirkeriyê ne



Leşker û çeteyên dewleta dagirker rojane li Efrînê kiryarên talan, dizî û hovîtiyê zêde dikin. Li dijî jin û keçên Efrînê destdirêjiyê dikin û zarokan bi kar tînin. Ji ber vê yekê rojane bi dehan malbatên li Efrînê mane bi rêbazên cuda ji Efrînê derdikevin û berê xwe didin herêmên Şehbayê.

### JIN NABE SERÊ XWE JÎ DERXÎNE!

Jina bi navê Qedriye Reşîd a ji gundê Maratê yê girêdayî bajarê Efrînê ye, ji ber kiryarên leşker û çeteyên dewleta Tirk, beriya çend rojan tevî malbata xwe ji Efrînê reviyaye. Reşîd a ku niha nişteciya kampa Serdem e dibêje: Çete bi gotinên xapînok ketin gundê me û ji bo ku baweriya gel bi xwe bînin digotin; ji bo ku we ji zilmê xilas bikin, em li virin! Lê paralelî van gotinan mal û milkên me talan dikirin. Gelek caran tade li jin û keçên gund dikirin. Zilamên gund direvandin û bi rêbazekî mafyewî bac dixwestin. Nahêlin ku jin serê xwe ji deriyê mal derxîne. Zêrên me didizîn û çûn û hatina me nava gund qedexe kiribûn.

### EFRÎN RASTÎ QIRKIRINA ÇANDÎ TÊ

Reşîd dewam dike û dibêje: Çeteyan cilên reş li jinan dikirin. Zarokên me bi hinek xwarinan li me dielimandin ta ku bi xwe ve girêdin. Zarokên li wan guhdar nedikirin jî lîstik li wan qedexe dikirin. Jin û zarokên gund di malan de hebiskirî bûn. Derbarê perwerdeya zarokan û rewşa dibistanan de Reşîd ev tişt anî ziman: Li dibistanan zarok tenê fêrî zimanên Erebî û Tirkî dibin. Tevî ku malbatên li gund ji vê yekê nerazîne jî, lê ji ber rewşa dagirkeriyê nikarin eşkere helwesta xwe diyar bikin. Reşîd dawiyê de tekez dike ku şêniyên li Efrînê mane, bi taybet jin û zarok, bi awayekî birêkûpêk rastî pişaftin û qirkirina çandî tên.



### ÇETE KEÇAN DIREVÎNIN

Ji aliyê xwe ve Helîme Ebdo ku bûka heman malbatê ye dibêje: Jina Kurd li Efrînê azadiya xwe ji dest daye. Kêlî bi kêlî rastî destdirêjî û tadeyên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê tê. Ebdo dibêje ku komên çete keçan direvînin û bê exlaqiyê derheqê wan de dikin. Ebdo dawiyê de got ku ew tevî malbata xwe ji ber van kiryar û hovîtiya dermirovî ya dewleta Tirk û çeteyê wê ji Efrînê reviyane…*Şîlan XOCE*

## Emê li dijî bêhiqûqiyê têbikoşin



Meclîsa Jinan a HDP'ê, têkildarî girtina Hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk KCD'ê û Parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Meclîsa Jinan a Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê, têkildarî biryara dadgehê ku ji bo Hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven da, daxuyanî da û diyar kir ku Leyla Guven vîna hemû jinên Tirkiye û gelan e. Meclîsê da zanîn ku wê vê bê hiqûqiya li dijî mafê jinê qebûl nekin û têbikoşin. Meclîsê, anî ziman ku destnedayîna Leyla Guven heye û li gorî Qanûna Bingehîn piştî Hilbijartina 24'ê Hezîranê êdî divê dozên wê bên rawestandin û neyê darizandin. Meclîsê da zanîn ku li gorî xala 83'an a Qanûna Bingehîn tu cudahiya wê ji 598 wekîlên li meclîsê tune ye. Meclîsê diyar kir ku darazê bi fermana Qesrê biryar daye û ev biryara hatiye dayîn li dijî hiqûq û mafên mirovan e. Meclîsê da zanîn ku danişîna dozê taloqî 4'ê Mijdarê kirine û got: "Bi vê yekê re rejîma AKP/Qesrê wêneyê rejîma nû ya li Tirkiye û Kurdistanê xêz kiriye. Em ê heta dawî li dijî vê yekê têbikoşin. Leyla vîna me tevan e û em wê bi tenê nahêlin."

## Ji bo azadiyê em ê têkoşînê bidomînin



Endama Rêveberiya Kongreya Star a Herêma Cizîrê Medya Mehmûd diyar kir ku di hilbijartinên avakirina meclîsên Kongreya Star de gavek pir girîng ji bo rêxistinkirina hemû jinan hat avêtin.

Rêveberiya Kongreya Star li hemû bajarokên Herêma Cizîrê meclîsên xwe ava kir. Di 25'ê Tîrmehê de li Hesekê, di 28'ê Tîrmehê de jî dê li Qamişloyê konferansên Kongreya Starê were lidarxistin. Derbarê avakirina meclîsên li bajarokên Herêma Cizîrê û konferansên ku dê pêk werin de endama Rêveberiya Kongreya Star a Herêma Cizîrê Medya Mehmûd diyar kir ku di nava rêxistina meclîsên Kongreya Star de wekhevî û pirrengî esas hatine girtin û diyar kir ku wê di konferansên 25 û 28'ê Tîrmehê de jî pêngavên nû yên ji bo çareserî û pêşketina hemû jinan bên avêtin.

Medya Mehmûd da zanîn ku armanca Rêveberiya Kongreya Starê ew e ku mafên jinan biparêze, wan bi rêxistin bike û got: "Berî ku şoreşa Rojava pêk were jin nikaribûn bi hêsanî tev bigerin û xwe pêş bixin. Lê piştî Şoreşa Rojava jinan xwe bi rêxistin kirin û di qadên civakî de gavên mezin avêtin. Heta niha jinan di warê rêxistinbûyinê de serkeftinên mezin bi dest xistin. Niha em wekî endamên Rêveberiya Kongreya Starê hewl didin ku jin bêtir xwe pêş bixin. Loma em meclîsên xwe ava dikin û em ê di navbera 25 û 28'ê Tîrmehê de li Hesekê û Qamişloyê konferansan li dar bixin. Jinê bi her cureyên rengên xwe beşdarî konferansê bibin."

Medya da zanîn ku armanca xebatan pêşketina jinê ye û wiha dewam kir: "Em dixwazin jin di qada perwerde, tenduristî, siyasî, aborî de xwe pêş bixe. Loma ji bo vîna jinê xurtir bibe û bikaribe ku di rêvebirina jiyana xwe de xwedî mafê gotinê be em dixebitin."

Medya di dawiya axaftina xwe de bang li hemû jinan kir ku beşdarî çalakiyên Kongreya Star bibin û got: "Hemû jin dema ku bi hêz û vînek azad beşdarî çalakiyên Kongreya Star bibin wê demê bikaribin ku bi hêsanî xwedî li nasnameya xwe derkevin û xwe biparêzin. Ji bo azadiya hemû jinan em ê her di nava têkoşînê de bin."…*Ronîda Hacî/Hesekê*

## Kongreya Star amadekariyên xwe yên Kongreyê didomîne

Rêxistina Kongreya Star a Eyn Îsayê amadekariyên xwe yên lidarxistina kongreya duyemîn didomîne.

Di vê çarçoveyê de, meclîsa nû ya kongreyê ya navçeyê hate hilbijartin.

Ji bo hilbijartina endamên Meclîsa Kongreya Star a navçeya Eyn Îsa ya Kantona Girê Spî, civînek hate lidarxistin.

Endama Rêveber a Meclîsa Jinê ya Girê Spî Înas Mihemed, endama Rêveber a Mala Jin ya navçeyê Xewle Ebdulcebar û bi dehan jin tevlî civînê bûn.

Di civînê de endama Rêveber a Mala Jin a Kantona Girê Spî Înas Mihemed rêziknameya kongrayê xwend. Her wiha behsa girîngiya rola jin di pêşketina civakê de kir.

Endama Rêveber a Mala Jin a navçeyê Xewle Ebdulcebar jî li ser girîngiya beşdarbûna hemû jinan ji van civînan axivî.

Di dawiya civînê de 4 jin wekî endamên Meclîsa Kongereya Star a navçeyê hatin hilbijartin.



# Divê civak li berxwedana Ocalan xwedî derveke


***Parêzerê Ocalan Rezan Sarica diyar kir yên ku bi salan e sîstema li Îmraliyê bi rê ve dibin, ew kes in ku rejîma niha afirandine û got, “Hiqûqa ku li rûmeta mirovan tê, alîgirê demokrasiyê ye û mafên mirovan diyar dike, bi ti awayî nikare sîstema li Îmraliyê îzah bike.”***

Ji parêzerên Ocalan Rezan Sarica got, ên ku bi salan e li Îmralilyê tecrîdê ferz dikin û sîstema li Îmraliyê bi rê ve dibin, ew hêz in ku mejiyê sîstema nû ya li Tirkiyê diyar kirine.

Parêzerê Buroya Hiqûqê ya Sedsalê Rezan Sarica da xuyakirin ku rejîma nû ya li Tirkiyê hatiye sazkirin ji ber sîstema li Îmraliyê hatiye afirandin.

Sarica bi bîr xist ku beriya biryara qedexekirina hevdîtinên bi Ocalan re jî qedexeya serdana parêzer û malbatan li Îmraliyê hebû û got, “Ji bo biryara dawî, cezayên hucreyê yên sala 2005’an û 2009’an ku bi cih hatine anîn weke hincetê nîşan didin. Bi vê biryarê re cezayên wê wextê ji bo niha dikin hincet. Di vir de hiqûq cara duyemîn tê binpêkirin.”

Parêzer Sarica diyar kir ku qedexekirina serdana malbat û parêzeran ancax bi qanûnan dikare bê ferzkirin û wiha dewam kir: “Qedexeyên li Îmraliyê beriya niha bi hinceta Rewşa Awarte dihatin ferzkirin. Piştre hewl dan bi biryarnameyên di hukmê qanûnî de vê yekê bidomînin. Ji bo qedexeyên li Îmraliyê mayinde bikin,



biryarnameyên hatin derxistin yek bi yek li nava qanûnan bi cih kirin.”

Sarica destnîşan kir ku pêkanînên li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, berî ya jî piştî Rewşa Awarte ji hev ne cuda bûn û got, “li Îmraliyê rêveberiya şidandî ku ji herêma qedexekirî ya leşkerî û Rewşa Awarte jî dijwartir e, her tim heye.”

Sarica da xuyakirin ku wan niha dosya birine ber destê Dadgeha Destûra bingehîn û wiha dewam kir: “Hiqûqa ku li rûmeta mirovan tê, alîgirê demokrasiyê ye û mafên mirovan diyar dike, bi ti awayî nikare sîstema li Îmraliyê îzah bike. Lê belê pêkanînên ji niha û pê ve serdema li pêşiya me wê ne rejîmeke destûra bingehîn û ne demokratîk be.”


Parêzerê Ocalan Rezan Sarica işaret bi rejîma nû ya li Tirkiyê hatiye afirandin kir û got, “Bi pêvajoyeke plankirî re guhertineke bingehîn hate kirin. Mejiyê ku hişt Dadgeha Destûra Bingehîn li pêşberî vê yekê bêdeng bibe û tevlî vê pêvajoyê bibe, mejiyê rejîma nû ye ku xwe dispêre zext û zordariyê. Yên ku bi salan e sîstema li Îmraliyê bi rê ve dibin, ew kes in ku rejîma niha afirandine.”

Sarica bi bîr xist ku wan timî digotin, hewl tê dayin sîstema li Îmraliyê li ser gelemperiya welêt ferz bikin û got, “Desthilatdariya ku dixwest civakeke bêdeng û tepisandî biafirîne, ji sîstema li Îmraliyê sûd wergirt. Pêkanînên li Îmraliyê pêwendiya xwe bi hemû beşên civakê hebû. Astengî û qedexeyên li Îmraliyê dest pê kirin, veguherî astengiyên li hemû girtîgehan û bi belavkirina tecrîdê re ev yek mayinde kirin.”

Parêzerê Buroya Hiqûqê ya Sedsalê Rezan Sarica diyar kir ku bi tecrîdê re têkiliya Ocalan ji civakê û tevahiya cîhanê re tê birîn û got, “Birêz Ocalan destûreke bingehîn a demokratîk danîbû pêşiya me. Kêm mabû ku ev destûra bingehîn bê amadekirin. Wê qanûna bingehîn bihata afirandin ku ji bo jiyana azad a hemû beşên civakê û ji bo demokrasiyê bibûya bingeh. Lê belê em îro ketine pêvajoyeke ku demokrasiya temsîlî ji holê hatiye rakirin, sîstemeke zext, şîdet û zordariyê ku em nikarin jê re bêjin otokrasî û ji aliyê hiqûqî û civakî ve nayê kontrolkirin.”

Sarica destnîşan kir ku tişta vê rewşê biguherîne û Tirkiyê demokratîk bike xwedîderketina gel, civakê û hemû hêzên demokratîk li berxwedana destanî ya Ocalan e.

## Li dijî dagirkeriyê divê Kongreya Neteweyî pêk were



Qasim Engîn diyar kir PKK hinekî lewaz bibe wê dewleta Tirk heta Kerkûkê biçe.

Endamê Komîteya Rêveber a PKK’ê Qasim Engîn li ser sedem û rewşa êrîşên li ser xaka Başûrê Kurdistanê, nerazîbûnên gel û helwesta rêxistinan, axivî û destnîşan kir ku dewleta dagirker bi pêşengtiya AKP-MHP’ê demeke dirêj e behsa bidestxistina xaka ku Osmanî lê serwer bûn dike û got; “Dagirkirina Efrînê, ne tenê dagirkirineke li Efrînê bû. Plansaziyek e. Plansaziya ku wekî Mîsakî Mîllî bi nav dikin ev e. Dibêjin ew ê Helebê û Mûsilê ku di dema xwe de eyaleteke Osmaniyan bû, bi dest bixin. Di nav vê eyaletê de Kerkûk, Silêmanî, Hewlêr hene. Ji ber vê yekê lazim e hinekî din berfireh bê dîtin. Ango mijar ne tenê Rojava, Başûr û Bakur e. Mijar bi giştî Kurdistan e. Ji xwe eşkere jî dibêjin. Ev êrîşa li ser başûrê welatê me tê kirin jî xwedî konseptekê ye. Hêza Îtîhadgerî ya faşîst îro li ser Kurdistanê heta bi giştî Rojhilata Navîn bi vê xeteriyê tevdigere.”

Engîn, kiryarên Osmanî û dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê bi bîr xist û got; “Tê gotin ku Mele Mistefa Barzanî li Zindana Amedê hatiye dinê. Wê demê ev zindan di dest Osmaniyan de bû. Şêx Abdulselam, yanî birayê mezin ê Mele Mistefa, Serokê Terîqeta Nexşiyan, bi destê Osmaniyan hat darvekirin. Şêx Ehmed jî hem mezinekî Barzaniyan hem jî şêxekî Nexşiyan e. Di 1930’î de ji ber êrîşên Iraqê yên bi piştgiriya Îngilîzan neçar ma biçe Bakur. Wê demê Kemalîstan ew girtin, tevî Mele Sidik radestî Iraqê kirin. 1968’an dema ku Abdulkerîm Kasim hinekî xwest nerm nêzî pirsgirêka Kurd bibe, yê ku herî zêde bi dijberiyê rabû dewleta Tirk bû. Di heman demê de em îro pirî behsa Sedam dikin. Lê ew peymana 1970’an ku heta 1975’an çû, herî zêde ji aliyê dewleta Tirk hat tehrîbkirin.

Em pir bi dûr ve neçin, 16’ê Cotmeha 2017’an, yê ku herî zêde heqeret li malbata Barzaniyan, li Kurdan kirin dewleta Tirk e. Ev rejîma dagirker faşîst ne ji Kurdan ne jî ji Ereban hez dike. Tevî ku rastî ev e, dewleta dagirker a Tirk 26 kîlometreyan ketiye nav xaka Başûrê Kurdistanê. Îro wekî hedef jî me nîşan didin. Lê em ji bîr nekin, dema ku em li vir kêmekî lawaz bibin, wê heta Kerkûkê biçin.”

### GOTINÊN DIZAYÎ Û BARZANÎ CIHÊ XEMGINIYÊ NE

Engîn têkildarî daxuyaniyên Sefîn Dizayî û Nêçîrvan Barzanî ku dagirkeriyê rewa dikin, bi kurtahî destnîşan kir ku cihê xemê ne û got; “Di rûdanên piştî 16’ê Cotmehê de PKK li kû derê vê bû? Dema ewqasî heqerat li ala Başûrê Kurdistanê hate kirin, ewqasî êrîşî referandûmê, êrîşî Birêz Mesûd Barzanî hate kirin, PKK li kû derê vê bû? Ma hafizeya me ne ewqasî teng e. Hê salek di ser re nebihuriye. Nîvê Başûr ji dest gelê me hate girtin. Lewma pêwîst e hinek kes destê xwe bidin ser wijdanê xwe û wisa biaxivin.

Ev dagirkeriya faşîst bi şiklekî vekirî dibêje ji Heleb heta Kerkûkê ya me ye. Ev gotinên Sefîn Dizayî û Nêçîrvan Barzanî cihê xemê ne, ti xizmetê ji bo siyaseta Kurd nakin. Dema ku dîrok rast neyê xwendin, siberoj jî rast nabe.”

### KONGREYA NETEWEYÎ DIKARE PÊŞÎ LI DAGIRKERIYÊ BIGIRE

Endamê Komîteya Rêveber a PKK’ê Qasim Engîn anî ziman ku dewletên dagirker her yek ji milê xwe ve siyaseta kevn a Îngilîzan ango politikaya ‘Parçe bike, belav bike, bi rê ve bibe’ dimeşînin, wekî dermanê vê pirsgirêkê lidarxistina Kongreya Neteweyî ye û got; “Kongreya Neteweyî helwesteke pêşdetir e. Li vir pêwîste em nebêjin hin alî xwe didin ber, hinek jî xwe jê vedigirin, lewma kongre jî lawaz dibe. Yê hazir divê werin û li ser navê neteweyê biryaran bigirin. Xebata sereke ya li hemberî vê dagirkeriyê demildest komkirina Kongreya Neteweyî ye.”…*ANF*

## Barzanî hevkarê dijminê Kurd Erdogan e



Omer Salih daxuyaniya Nêçîrvan Barzanî rexne kir û diyar ku hevbendî bi dijmin re nabe û got, “Barzanî bi vê daxuyaniyê hevkariya xwe ya bi Erdogan re tîne ziman û Barzanî bûye berdevkê Erdogan.

Endamê Desteya Damezirîner ê Partiya Azadî û Demokratîk a Êzidiyan (PADÊ) Omar Salih diyar kir ku gefên Erdogan li ser Şengalê jî hene, lê ew nahêlin komkujiyeke din li ser gelê Êzidî bê dubarekirin.

Omar Salih êrîşên dagirkeriya dewleta tirk li ser axa başûrê Kurdistanê nirxand û diyar kir ku heman êrîş beriya niha jî li ser başûrê Kurdistanê hebûn û wiha got: “Dewleta tirk ji 30 km zêdetir sînorê başûrê Kurdistanê derbas kiriye û li wir xwe bi cih kirine. Li ser armanca vejandina Dewleta Osmanî êrîşên xwe li Kurdistanê zêde dike. Ji bo wê armanca xwe jî bûye gurê har. Erdogan bi hinceta Tevgera Azadiyê êrîşî Başûr dike, pirsa min ji Erdogan ew e ku hûn çima êrîşî DAIŞ’ê nakin?”

Salih Omar di berdewama axaftina xwe de da zanîn ku dewletên navneteweyî bi giştî li dijî êrîşên dewleta tirk ên dagirkeriyê çavên xwe girtine û wiha dewam kir: “Mixabin helwestên dewleta Iraq û parlementoya Iraqê jî ne zelal in. Pêwîstê dewleta Iraqê û parlementoya Iraqê li dijî dagirkeriya dewleta tirk helwesteke pratîk nîşan bidin.”

### BARZANÎ BUYE BERDEVKÊ ERDOGAN

Omar Salih daxuyaniya serokwezîrê herêma başûrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî rexne kir û wiha got: “Serokwezîrê herêma başûrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî dijminê gelê kurd Erdogan pîroz kir. Ev daxuyanî cihê rexnê ye. Hevbendî bi dijmin re nabe. Nêçîrvan Barzanî bi daxuyaniya xwe da nîşan ku ew hevkarê Erdogan e. Her wiha Barzanî bûye berdevkê Erdogan.”

Omar Salih bal kişand ser gefên Erdogan ji bo Şengalê û wiha got: “Gefên Erdogan li ser Şengalê jî hene. Lê li ser gelê êzidî em nahêlin ku komkujiyeke din were dubarekirin. Erdogan nikare di Şengalê de gavekê bi pêş de here.”

Endamê Desteya Damezirîner ê Partiya Azadî û Demokratîk a Êzidiyan (PADÊ) Omar Salih di dawiya axaftinên xwe de diyar kir ku gelê başûrê Kurdistanê li dijî dagirkeriya dewleta tirk çalakiyên xwe didomîne û baweriya gelê Başûr xurt e…*ANHA*



# Hevkariya Barzanî Erdogan wê bi ser nekeve

***Çalakiya Mertalên Zindî ya Rêxistina Ciwanan a ku li dijî dagirkeriya dewleta Tirk li Qendîlê dane destpêkirin dewam dike. Ciwanên Wargeha Mexmûrê piştgirî dan çalakiya mertalên zindî ya ciwanan a li Qendîlê û diyar kirin ku wê hevkariya Barzanî û Erdogan ya li dijî gelê Kurd wê ser nekeve.***

Ciwanên Wargeha Mexmûrê piştgirî dan çalakiya mertalên zindî ya ciwanan a li Qendîlê û dagirkeriya dewleta Tirk a li ser xaka Başûrê Kurdistanê şermezar kirin.

Çalakiya Mertalên Zindî ya ji aliyê Komeleya Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê û Rêxistina Jinên Ciwan ên Têkoşer ve li dijî dagirkeriya dewleta Tirk dayîn destpêkirin ku mehek li pey xwe hişt, dewam dike. Mertalên Zindî ji bo beşdarbûna bîranîna ku wê di 14’ê Tîrmehê de bi boneya salvegera Berxwedana Zindanê li Qendîlê were lidarxistin, banga beşdarbûnê li ciwanên Başûrê Kurdistanê kirin.



Ciwanên Wargeha Mexmûrê têkildarî piştgiriya ji bo çalakiya mertalên zindî ya li Qendîlê axivîn.

Ciwanê bi navê Mazlûm Tok bal kişand li ser dagirkeriya dewleta Tirk a li Başûrê Kurdistanê û wiha got: “Ez weke ciwanek yê wargehê, dagirkeriya li ser Başûrê Kurdistanê şermezar dikim. Em wek gelê Kurd û bi taybet wek ciwanên wargehê, piştgiriya ciwanên ku li Qendîlê bûne mertalên zindî dikîn. Di van demên dawî de em dibînîn Barzanî hîn zêdetirîn dijbertiya xwe ya li himberî gelê Kurd dide pêş û her ku dem derbas dibe li şûna ku dewleta Tirk wek dagirker bide diyar kirin, PKK wek dagirker diyar dike. Ev jî bi xwe re xayîntiya di nava Kurdan de kûr dike û bi vî awayî dixwaze yekîtiya gelê Kurd xira bike.”

Jina ciwan ya bi navê Çîdem Demir jî dagirkeriya Başûrê Kurdistanê wiha nirxand: “Ez ji weke jinek ciwan a li Wargeha Mexmûrê piştgiriya ciwanên ku li Qendîl bûyîn mertalên zindî dikim. Hêvîdarim ku ciwanên Başûr û giştî ciwanên Kurdistanê xwedî li xaka Başûrê Kurdistanê derkevin û rê nedin dewleta faşîst ya Tirk û hevkarên wê.”

Cîwanê bi navê Cîhat Gûngen nerazîbûna xwe ya li hemberi dewleta Tirk nîşan da û got : “Ez jî wek ciwanek yê Wargeha Şehîd Rûstem Cûdi, berxwedana ciwanên Başûrê Kurdistanê ya ku li Qendilê ev meheke ku xwe kirine mertalên zindî û li himber lîstokên dewleta Tirk serî natewînin silav dikim. Em dagirkeriya dewleta Tirk ya ku li ser Başûrê Kurdistanê dide meşandin şermezar dikin, pêwîste em wek ciwan nehêlin ku ev lîstokên qirêj yên li ser gelê Kurd bên kirin. Em ji weke ciwanên Mexmûrê pêwîste li vîn û axa xwe xwedî derkevîn.

Ciwanê bi navê Berxwedan Kara jî ev tişt anî ziman; “Ez jî wek ciwanek yê wargehê, di serî de silavên xwe ji bo ciwanên di koma mertalên zindî de cih girtîn û hemû ciwanên berxwedêr re dişînim. Ev dagirkeriya dewleta Tirk ya ku li ser Başûrê Kurdistanê pêktîne, em şermezar dikin, divê ciwanên me yê her çar parçeyên Kurdistanê bêdengiya xwe li hemberî van dagirkeran bişkine. Ew hevkariya ku Barzanî û dewleta Tirk a ku li himber gelê Kurd dike, nikare vîna Gelê Kurd têk bibe.”…*ROJNEWS*

## Çeteyên êrîşî Efrînê kirî li Idlibê hatin kuştin

Şervanên Odeya Xezeba Zeytûnê, li başûrê Idlibê operasyonek lidar xist û 5 çeteyên dagirker ku di dagirkirina Efrînê .xwedî rol in hatin kuştin

Berdevkiya Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê ragihand, li başûrê Îdlibê operasyonek lidar xistine û 5 çeteyên dagirker hatin kuştin. Hat ragihandin ku ev çeteyên hatî kuştin di dagirkeri-.ya Efrînê de xwedî rol in




Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: “Hêzên me du çalakî pêk anîn; çalakiya yekemîn di 9`êTîrmeha 2018`an de li dijî çeteyekî Feyleq El-Şamê yê bi navê Îbrahîm Ebdullrezaq li bejahiya başûr pêk hat. Çeteyê ku motorsîklet diajot, piştî ku ji aliyê hêzên me ve hate şopandin, hate hedefgirtin û .bêbandorkirin

Çalakiya duyemîn jî di 10`ê Tîrmeha 2018`an de li dijî erebeyeke çeteyan ku 4 çeteyên Feyleq El-Şamê dibirin, pêk hat. Tê zanîn ku her çar çete tev li dagirkeriya bajarê aştiyê bûbûn û mal û milkên welatiyan talan kirin û heqaret li şêniyan kirin. Ji ber vê yekê şervanên me erebe hedef girtin û hemû çeteyên .di erebeyê de hatin kuştin

Çeteyên ku hatine kuştin navên wan wiha ne: Hisên Îbrahîm Mustefa, Mihemed El-Kermo, Eymen El-Xalid, Xezwan El-.Hisên

Hêjayî gotinê ye ku çalakî li bejahiya başûrê Idlibê pêk hat. Ev yek jî tekez dike ku em li hemû deverên ku zilm û zordarî ji aliyê artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê ve li ser gelê me tê meşandin li wê derê ne. Ji ber vê yekê jî em soz didin her kesê ku destê wan di dagirkeriya Efrînê de heye û mal û milkên gel talan kirin û heqaret li gel kirin dê hesabên giran ji wan were xwestin. Wekî ku me soz da we, tiştên tên girantir in. Efrîn, sebir .bike tohildan tê

## Bi yekîtiyê wê dagirkerî têk biçe



Mamostayên Zanîngeha Germiyan yê aliyên siyasî li hemberî dagirkeriyê bêhelwestî rexne kirin û eşkere kirin ku yekbûna .Kurdan wê dagirkeriyê têk bibe

Êrîşên dewleta Tirk ên li ser xaka Başûrê Kurdistanê didonim. Dewleta Tirk ji bo berdewamkirina êrîşên xwe nakokiyên di nava Kurdan de bi kar tîne.

Di vê derbarê de mamostayên zanîngeha Germiyanê axivîn û bertek nîşanî dagirkeriya tirk û bê helwesetiya li dijî dagirkeriyê . dan

Mamostayê Zimanê Erebî Mako Ehmed wiha got; “Yekbûna Kurdan û di yek eniyê de parastinkirin, wê bibe faktora sereke ya pûçkirina dagirkeriya Tirkiyê ya li ser xaka Başûrê Kurdistanê. Lê, nakokiyên navxweyî wiha kiriye ku Tirkriye bi hêsanî çiya û dolên Kurdistanê ji bo xwe “.bike milk

Mako Ehmed wiha dewam kir; “Eger tevahiya gelê Kurd û alî bi taybet yekgirtî bin wê dijmin nekare dagirkeriyê bike, lê dema ku dijmin cesaret wergirt, êdî wê derza heyî ji bo pêşveçûn û “.qayîmkirina xwe bi kar bîne

### ARMANC PIÇÛK KIRINA BAŞÛR E

Mamostayê Ragihandinê Yedgar Elî jî wiha axivî; “Dagirkeriya dewleta Tirk li ser xaka Başûrê Kurdistanê dike, bi hemû awayî binpêkirina qanûnane. Armanca Tirkiyê bi vê dagirkeriyê biçûkkirina Başûr e. Helbet vê pêngavê piştî referandûmê destpê kir. Ji derveyî dagirkeriyê dorpêça aborî û siyasî danî li ser Başûr. Mixabin, hikûmet û PDK’ê ne tenê helwesta wan nebû, heya şansekî mezin dane “.Tirkiyê

### PDK’Ê DESTÛR DAYE TIRKIYÊ

Mamostayê Ragihandinê Yedgar Elî di dawiyê de wiha got; “Parlamento û hizbên siyasî yên Başûrê Kurdistanê ji ber sedemê parçebûn di nava wan de ye, nekarine bibin xwedî yekîtiyek bihêz û rê li pêşiya dagirkeriya Tirkiyê bigirin. Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) jî destûr daye artêşa Tirk ku li ser Başûrê Kurdistanê êrîşên leşkerî bikin.”…*ROJNEWS*



## 14’ê Tîrmehê û rûpelên berxwedanê

Mihemed SEYDÎ

Teslîmbûn an jî berxwedan.Çerxa qedera paşerojê bi van herdû hevokan digeriya. Radestî hêsan bû, lê berxwedan zor û zehmet bû.

Sibê salvegera 14’ê tîrmehê,berxwedana zîndana Amedê ye. Di dîroka kurdistanê û tevgera azadiyê de rûpeleke nû ya berxwedanê dest pê kiribû. Li ser bîranîna kadroyên Pêşeng ên PKK’ê Mihemed Xeyrî Dûrmûş, Kemal Pîr, Elî Çîçek û Akif yilmaz û berxwedana wan a dîrokî, îro li gelek deveran berxwedan tê meşandin. Ji zîndana Amedê rihê berxwedanê li nava rihê ciwanên kurdistanê belav bû. Doh li Amedê îro jî li Qendîl, Biradost û Efrînê belav bû.

Berxwedana zindana Amedê li dijî dagirker û faşistan bû. Berxwedan mezintir dibe û heta hesab ji hemû dagirker û nûkerên dagirkeran dixwaze. Li Kobanê Arîn û Rêvana sembolên berxwedanê û têkoşîna li dijî çeteyên dewleta Tirk a dagirker bûn. Li şengalê 12 gerîlayên li pêş dijmin xwe kirin bend û rê li pêş komkujiyên mezintir girtin dewama vê berxwedanê ye..

Li Efrînê jî Avêsta û polatan û bi dehan şervanên fedayî li ser vê xeta berxwedanê ku çiroska xwe ji berxwedana zîndana Amedê digre tê meşandin. Dîsa li başûrê kurdistanê li dijî dagirkeriya Tirk çalakiyên gerîla didomin û berxwedana li hemberî hemû hêz û teknîka dagirkeran a pêşketî mezintir dibe.

Gotina Yek ji Pêşengên Berxwedana 14 Tîrmehê Mihemed Xeyrî Dûrmûş ya meşhûr ku xwestibû “ deyîndarê gelê xwe ye “ li ser gora wî bê nivîsandin, îro bi hezaran niştîmanperwer xwe deyndarê wê gotinê dibînin û gelê kurd vê gotina wî weke peyamên bilindkirina têkoşînê qebûl kir.

Wekî me di destpêkê de jî anî ziman. Teslîmbûn hêsane lê berxwedan zor û zehmete.

Ev gotin jî rastiya kurdistanê dide ber çavan. Her demê berxwedêran xeta berxwedanê esas girtine û teslîm nebûne. Teslîmkar û îxanetkaran jî li gel dagirkeran cihê xwe girtine.

Şengal tevî gelê wê yê Êzîdî hat firotin, kerkuk hat radestkirin. Ev ne îxanet be çiye?!. Yên ku gotin li rojava şoreş tune û bi her awayî û ji dagirkerên li ser kurdistnaê zêdetir êrîş kirin kî bûn ger ku em wekî sembolên Îxanetê nebînin û pênase nekin. Ên ku niha li Efrînê li gel dagirkeran cih digrin ne teslîmkar û îxanetkarbin çine?.

Li başûrê kurdistanê teslîmiyeta PDK di dîrokê de tê zanîn û cihgirtina li gel dagirkeran li ber çava ye. Li Efrînê jî teslîmbûn û xiyaneta kesên wek fûad Elîko û birahîm biro jî dewama vêye. Em naxwazin navan bînin ziman, lê ew êdî gihiştine vê astê ku bûne sembolên îxanetê yên dawî.

Lê ti carî bîranînên li ser berxwedanê hatine avakirin ji riya xwe derneketin û her dem hesab ji îxanetkaran pirsîne, dipirsin û wê bipirsin.

Berxwedana zîndana Amedê dema tê ziman dijmin dilerize û her wiha yên ku difikirin wê vê tevgera berxwedêr biqedîne jî..

Dem dema hesabxwestinê ye. Yên civîn û bazarên veşartî li ser hesabê gelê kurd ê berxwedêr dikin û dibin hevkarê dagirkeran helbet wê bê hesab nemînin û gelê kurd yê xwe deyndarê Xeyriyan û Kemalan dibîne wê hesab bi rihê berxwedana 14 tîrmehê bipirse.

Her kes divê Xeta xwe diyar bike, Îxanet û Teslîmbûn an jî berxwedan.